# GÖLSAG-AVRUPA YÊ KONGREYA XWE ÇÊKIR

*(Gölyazı ve Sağlık köyü Sosyal Yardımlaşma ve Dayanışma Birliği)*

Di 11.12.2004an da li Siwîsrê, bajarê Baselê Gölsağ Avrupa kongreya xwe çekir. 50 endam beşderê civîne bûn.

Di kongrê da programa sinevizyon hate pêşkêşkirinê. Bi navê Komiteya Revebir birêz Bilal Akarsel axafinek kir. Di axaftina xwe da ji bo yekitiyê mesajên hêja anîn zimên.

Karûbarê salekê û rewşa aborî ji raporên amedekirî hatin xwandin û li ser wan xeberdan çêbûn û hatin qabûlkirin.

Ali Kale, Bilal Akarsel, Mehmet Biçer, Mehmet Şimşek, Ömer Koyuncu, Şemo Çakmakçı û Yusuf Topal ji bo komiteya nû hatin helbijartinê.

Civîn bi daxwazên ji bo peşêrojê hate qedandin.

**Çavkanî: Malpera Gölsagê**

## Cîvîna Bîrnebûne li Baselê

Di 29/01/2005 de li bajarê Baselê, bi bejdariya 25 kesan ve li ser kovara Bîrnebûnê û herwiha rewşa malbatên ji kurdên Anatoliya Navîn sohbetek hat kirin. Di wê sohbetê da piranî li ser naveroka kovarê û piştgiriya wê hate qise kirin.

Berpirsê kovarê, Ali Çiftçi bi kurti li ser rewşa kovarê agahdarî da. Bejdarên civînê jî hem li ser naveroka kovarê û hem jî ji bo belavkirina wê pêşnîyarên xwe anîn ziman. Di vê civînê de 20 kesên nû jî bûn aboneyê kovarê, du kes jî ji bo belavkirina kovarê berpirsiyarî girtin ser milên xwe ku hîn baştir kovar bêt belav kirin. Herwiha pêşniyariyek hat ku di demeke nêz de civîneka berfireh ya dê û bavan bêt organize kirin ku di vê civînê de li ser rewşa malbatî û perwerdeya zimanê zikmakî sohbetên berfireh bên kirin.

***Li Stockholmê şeva çandî ya Kurdên Anatoliya Navîn di 30ê Nîsanê de li Restauranga Mozaîk çêdibe.***

Piştî avabûna Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn ku piraniya endam û hevalbendên wê li bajarê Stockholmê ne, hersal şeveka şênawiyê ji bo hemwalatiyên xwe bi hevkariya kovara Bîrnebûnê çêdike.
Ew kesên ku bixwazin bên şeva şênawiyê dikarin li vê telefonê agahdarî werbigrên. **Tlf: +46 (0)70-37 65 670**